

Hejmar (9)

15 - Avdar - 2014

Çandî - Giştî - Serbixwe - Nîvmehane ye






Rêyên biçûk jî mirovan dighînin

Ji tiştên zehmet di jiyanê de destpêk in , ji ber ku dema destpêk hebin çi karê li pişt wê tê, nema bi wê zehmetiyê ye, li vir ka mirov bipirse ku rojnamegerî û medya kurdî li Sûriyê dest pê kiriye an na? Helbet tiştek li ser zemînê heye ku dihêle mirov zanibe ku tiştek hatiye destpêkirin , li vir kovarek dest bi weşanê dike, û li wir radyoyek du sal li ser weşana wê derbas dibin, û nêzîk ev tişt dê li ser televizyonan bêñ gotin tevî ku anîha hin kenal bultenêñ taybet bi ser kurdêñ Sûriyê diweşînin .

Belkî gelek ji van projeyan roniyê nebînin û nikarîbin berdewam bikin lê herhal dê hinek proje wê bimînin, û belkî tiştê herî zehmet di berdewamiya di van projeyan de ew e ku pitgiriya madî ji wan re tuneye, lê li vir û li wir hinek proje dibin xwedî piştgirî û dê karîbin problema herî mezin di têkçûna projeyên ragihandinî de ku berî şoreşê kelema herî mezin bûn, derbas bikin.



Belê , îro û piştî ዘ salan ji temenê şoreşa sûrî, em dikarin bêjin rîyeke biçûk ji ragihandina bi kurdî hatiye vekirin , ev rê , ku em wek kovara Welat xwe dibînin beşek jê , dest pê kiriye , bi hezkirina we wek xwendevan û gel dê berdewam bike.

— Aras Yûsiv 





Qamişlo Adarê pêşwaz dike

Dîsa heyva Adarê bi şahî û xemgîniyên xwe bi ser bajarê Qamişloyê de hat.

Adar taybetiyeke xwe heye li nik Kurdan bîtevahî û yên Sûryayê bitaybetî, herwiha gelek bûyerên dîrokî di wê de hene ku hêj di bîraweriya xelkên bajêr de ne.

Di yekê heyyê de milet bîranîna 35mîn a salvegera Mele Mistefa Barazanî lidar xist bi ahengeke gelêri mezin.û di vê helkeftinê Barzaniyê nemir û têkoşîna wî ya dirêj di ber doza Kurdî de bibîr anîn û wisa jî gelek çalakî hatine kirin bi mûzik û şano û helbestan re.

Kawa Xeîl ciwanike Kurd ji me re li ser vê bîranînê axift:

Her sal em bi vê helkeftinê radibin ku em mirovekî mezin bibîr dihênen û serokekî mîna Barzanî ti carî ji bîra me naçê û ew ê di dîroka Kurdî de dê bimîne û navî wî bi tîpêñ zêrîn xemîl û neqşa vê dîrokê be.

Herwiha 8ê Adarê jî rojeke taybet e,ew jî roja cîhanî ya jinê ye ango(Cejna Jinê),

Weku tête zanîn cîhan bitevahî di vê rojê de şahiyê dike û jin di wê de tête rêzkirin weku beşeke bingehîn di jiyanâ hevdem de,û li Qamişloyê jî û bi gelek çalakiyan xelkên bajêr ev helkeftin lidar xistin û jî hêla glek partiyêni siyasi, rîexistinê ciwanan, saziyêni jinan û herwiha jî gelek aliyên din,û bi festivalin rengereng û li dirêjahiya 3ê rojan çalakî berdewam bûn.

Şêrîn Hesen çalakvan e di mafêni jinê û endama Komeleya Ronî ya jina Kurd e taybetiya vê rojê ji Welat re şîrove kir û got: helbet ev roj rojeke girîng e,ji ber ku em weke jin me xebatêne mezin kirine di civakê de û me doza mafê xwe kiriye mafêni azadiya me da em bikaribin bi erkên xwe rabin jibo xizmeta gelê xwe bikin, Şêrîn wisa berdewamkir: em hêj vîndar in ku em rîya xebata xwe berdewam bikin da jin bigihêje asteya xwe ya bilind.

Li aliyekî din û di 9ê Adarê de bîranîna hunermendê mezin Mihemed Şêxo ye.

Weku tête zanîn Mihemed Şêxo di sala 1989an de ji cîhanê koçkiribû û li paş xwe şûnwareke zengîn û rengîn hîstibû çi di warê hunerê û çi di warê têkoşînê de, pişî ku jiyanike dijwar bihurandibû.

Hewiha xelkên bajêr bi ahengeke gelêri Hunermendê Nemir bibîr anîn û li ser gora wî ya li goristana Hilîliyê gelek ji stranê wî xwendin û wisa jî silav li giyanê wî yê pak kirin.

îmad Talatî



Li ser vê helkeftinê bilûrvanê Kurd Ronas Şêxmûs wisa şîrovekir:

Mihemed Şêxo her û her dê bimîne dî bîraweriya me de,ew î hunereke rengîn ji me re hîst û em hêj fêrî mûzikê dibin di rîya wê re,ew î xebateke balkêş ji doza miletê xwe re kiribû û ew ê dê bimîne simbola henera netewa Kurdî.û ji hêla mûzikî ve jî ew mûzikjeneke mezin bû û kêm hene ku bikaribin bi rengê wî mûzikê pêşkêş bikin, ew ê dê sax bimîne di dilê me de.


Herwiha û di 12ê Adarê de dîsa milet dakete kolanan di salvegera 10mîn a serhildana Qamişloyê û bi coşkeke mezin ew serhildan bibîr anîn,û wêneyêne pakrewanên wê hilgirtin û bi navê wan bangkirin.û bi siloganên mîna yekîtiya Kurdan xwepêşandan lidar ketin, hevdem bi cenaziyê 8 şêhîdên Kurd ên ku di encama teqîneke xwekj de ji hêla komên tundirew ve jiyanâ xwe ji dest dabûn di 11vê heyyê de.

Serhildana Qamişloyê simbola berxwedana gelê Kurd e dijî rîcîma hov û xwînmij.û pakrewanên wê her û her dê di bîraweriya milet de dimînin zindî.

Wisa Adar destpêka demsala buharê ye, û milletên Qamişloyê hêvîdar in ku ev heyy bibe navnîşana buhara azadiyê ya ku hêj bendewarê wê ne.



Bêbuar hate bibîranîn



Xalid Şêxo

Bêbuhar an Yûsiv Berazî kesayetike navdare bû ne tenê li Serêkaniyê lê belê li hemû deverên Kurdî nemaze di warê wêje û helbestê de , helbestên wî yên ku bi awayê kilasik hevokê wan di rêsand bi gotinên Kurdiya zelal û hesan mesaca xwe ya wejeyî dighand miletê xwe û pirtûkxaneya kurdî bi 5 diwanên hêja zengînker.

Di van dîwanan de êş azariya miletê Kurd û civaka wî li Sûriyê nivîsan nexasim ku ew wek kesane ezmûnên dijar debaskir di xebate xwe ya partîtî û siyasî û bi dehê caran hatgirtin ji aliyê hêzên ewlekarî li parêzgeha Hesekê û ew tim rastî êş û lêdanê dibû.

Ji bo min ev helbestvanê bejin bilind ne tenê helbestvanekî resen bû lê xebatkarekî bi hers û vînek hesînî bû , û tevî ku ez bi temenê xwe we zarkê wî yê

herîbicûk bûm lê wî rezdarî ya digirt û ji bo xebata wî yak u hêjaye ku her kes alîkarbe bi wî re min ximeta wî kir di çapkirina dîwana wî ya çeremîn û di wê demê de min hevaltiyek zengîn bi wî re buhirt lewra ez pir êşiyam bi bi nexweşıya wî û bêtir bo koça wî ji nav me. Bêbuhar bi helbestên xwe ew hasten mirovayetî yê bilin di gotinê xwe de anî ziman û pirên herî zehmet di civka kurdî de derdixist holê û cara van pirsan dida milet ji pêşketina wî di her warî de , hêviyên wî jib o me gelek bûn û dixwest ku nifşê nû li xwe û netewa xwe xwedî derkeve di riya xwendin û zanebûnê de pêşbikeve .

Bêbuhar yê xwediyyê ruwê kenok û navdar bi henekê xwe nimûneya mirovekî Kurdê xurt bû di jiyanê tevî aloziyên kambax ev milet birêve dibir.



Rewşa abûrî li Dirbêsiyê



Bajarê Dirbêsiyê ji demeke dirêj ve di aloziyên abûrî de derbas dibe, xelkên bajêr bitevahî zehmetiyan dikêşînin ji ber vê rewşê, ji ber ku pêdiviyêner sereke êdî nema di bazara bajêr de peyda dibin, an ku dema hin ji wan peyda dibin ew bi nirxên buha ne .ji hêleke din ve diyardeyeke xirab hatiye holê di dema dawî de ew jî belavbûna madeyêner çirûk (xirabe) di bazarê de, yên ku dema wanbihurtî ye û ew jî dibe sedema gelek pirisgirêkên tendurstî ji şêneyêner bajêr re .herwiha sedema vê diyardeyê pêwariya çavdêriyê li ser van madeyan e.

Birêz Hesen Oso cîgirê serokê encûmena xwechî li Dirbêsiyê ji Welat re wisa axift : buhabûna her tiştî sedema xwe ya sereke bazirgan e, ew nirxên hemû tiştî bi Dolarê ve girêdidn, tevî ku gelek ji madeyan ji mêj ve di stokêner wan de ne, lê ew bi keysbazî danûstandinê bi vê rewşê re dikin û birastî pêwîst e ku çavdêrî li ser wan hebê da ku êdî nema wisa li gorî bercewendiyêner xwe yên diravî nirxan buha bikin.

Ji hêla xwe ve birêz Mehmûd Îsa endamê komîteya lihevhatina civakî ya EGRKê tekez kir li ser madeyêner xirabe ku girng e ew ji bazarê derbikevin û wisa berdewam kir:pêwîst e ku komîteyeke bispor bête damezirandin û karêner bazirganan bişopîne ji hêla nirxan ve û ji hêla madeyêner ku dema wan qediyane. Û ew komît ci kesêner ku ziyanê bikin di van mijaran de dibe ku bêtin dadkirin.

Rewşa Sûryayê bitevahî û ya herêmên Kurdî bitaybetî aloy in, dibe ku kesêner berpirisyar li milet xwedî derbikevin û bi erkên xwe rabibin, û derfet hebê jî ku saziyêner lihawarçûyînê derbas bibin û alîkariyan bidin ci kesêner hewcedar, an jî ew ê dê firtoneyeke mirovahî li van herêman peyda bibe û êdî çareserî ji wê re dê pir dijwar be.

Sadon Al Sîno



Nehedana diravî û bandora wê li ser milet

Ji destpêka şoreşa sûrî gelê rojava hêviyên mezin Dirêsan.

baweriya wan ew bû: ku beramberî rewşike abûrî nû de biçin pêre di ramanên xwe de diçinîn

ku di demek nêz de wê ji rewşa neçariyê derbasbibin

Lê mixabin ew omîd û baweriyên wan bi cî nehatin û roj bi roj rewşa wan xerab di be

Bi taybet kesên xwedî xîzan û kuflet.

Sedema vê birçîbûnê bi gelek wateyan têne gotin

Hin dibêjin ji ber buhabûna ku bazirganên me destê wan tê de heye û her kes li gorî xwe firotinê dike

Dêmek girêdana wan bi dolar re nebûna qîmet ji leyra sûrî re.

Li vê derê pirsên welatiyan jî cî digire Welatî di bêjin eger bazrgan di bêjin em girêdayîne bi dolar

çima dema ku dolar dadikeve buhayî bêtir dibe .

û pirsa wan tim bê bersev e

Lê bazirgan jî teqez dikin ku qet destê me di vê buhabûnê de tuneye .

lê nehedana diravî .. abûrî û metirsiyê ji ber aramîya rê bi taybet piştî dorpêckirina bajarokên rojava ji komên islamî ew dîbin sedema buhayê.

mamostak diwarê abûrî de kardike anî ziman

Ev qonaxa ku em îro di wê de



derbasibin ji hêla rewşa abûrî ve ji destpêka şoreşê

gerk me bida ber çavêن xwe ku wê rewşa abûrî xirab bibe wê buhayî hebe ji ber qlenê azadiyê girane.

û di hemû şoreşen cîhanî de abûrî li paş dikeve lewra berdewamiya jiyana xelkên rojava di vê demê de

Bi alîkariya xelkên wanî ku li dervene wekû tê zanîn her malbatek kesk wan li welata heye û kurdistana başûr jî bû alîkar di vî warî de pirên penaberan li wir kardikin.

wek me diyarkir ev alozî di vê ku li ser bê rawestandin û şîrove bibin

lewra hêvî û banga me ew e ji hemû kesên berpirisiyar ku bikaribin vê babetê çareser bikin û êşen xizanan bi sîngeke germ himbêz bikin .

efsanê Amûdê.....Alan Alûcî



Dema ku mûzîk dibe çav ji mirov re



Yezdanê dilovan çav dane mirovan da bikaribin xweşî û nexweşiyê jiyanê bibînin, û her mirovek di cîhanê de rola xwe dileyize û kar û xebatê dike da xweşiya jiyanê bibîne, lê kesin xwedî pêdiviyê teybet gelek zehmetiyê dikşînin ta bigihne asteya xweşiya mirovên saxlem, wek hunermend BIRÎNDAR ew ciwanê ku ji roja jidayikbûna wî li ser riwê cîhanê ronahî bi çavê xwe nedîtiye, BIRÎNDAR temenê wî 30 salî ye li gundê QASTIPANÊ, ya ku li herêma Girkê legê ye, dimîne, sedema tinabûna dibistanê teybet ji kesên xwedî pêdiviyê teybet re li parêzgeha Heskê wî berê xwe dabû Dêra zorê û du salan li wir xwe fêrî şêweyê teybet bi kesin ku ronahiyê nabînin kir, şûnve dest bi mûzîkê kir ji 15 saliya xwe ve wî dikarîbû di rêya mizîkê de reşbûne li ser çavê xwe ji bîrbikê, saz ji xwere dît ronahiya çavên xwe li jîyanê, û bû endamê koma Helebça beşê mûzîkê di 20 salîya xwe de.

Jibo hezkirina wî ji mûzîkê re, Birîndar wisa ji kovara welat re axift: dema ez dirahêjime sazê, cîhan li pêş min dibe ronahî û ez gelek di rêya si-tranan ji jîyanê hezdikim

û got dema ez li ser gul û çem û daran dibêjim, ez wan di dengê saza xwe de dibînim.

Birîndar berê xwe da penaberiyê li Başûrê Kurdistanê, û 3 heyvan li Zaxo û Hewlêrê qedandibû, xwesteka wî bû ku kar bike di komin mizîkê de ji ber rewşa malbat wî ya abûrî zehmet e, lê kesk li wî xwedî derneket û ew ma bê kar û vegariya gundê xwe, Herwiha bi dehan kes xwedî pêdiviyê teybet li herêma girkê- legê payde dabin û ew rojin xwe dibihrûnin bê ku ti kes alîkariya wan bike hêvî û daxwaziya wan avakirina rêxistin yan dibistanin teybet ji ci kesên wek wan re.

GULAL LIYANÎ





Şoreşa Jina Kurd li Sûryayê

Fener Ehmed

Jina Kurd di hemû deman de dikaribû xwe bike beşeke sereke di civakê de û hevkarê mîr be di gekek aliyêن jiyanê de, tevî gelek alozî û kelemêن ku dibûne astengî ji wê re, lê ew neçar nedibû û xebata xwe berdewam dikir.

Di Sûryayê de jî jin bi şêwazeke nûjen dakete civakê û li ser gelek asteyan kar dikir û ji destpêka şoreşê ve ew ê xebateke balkêş kiribû nemaze di xwepêşandan de.

Herwiha ji encamên keda wê gelek sazî û rêxistinên ku di karê jinê de bispor in hatine damezirandin. û ew di gelek mijaran de mijûj in mîna karêن perwerdeya zarotiyê ,fêrkirina ziman, yasayî...hwd..

Çalakvan Wefa Osman endama komîteya têkiliyên diplomasî di Yekîtiya Star de li bajarê Dêrikê wisa ji me re axift:

Tevî gelek astengiyan jin xebateke bêhempa kiribû û wisa jî hebûna xwe di civakê de resen kir, û em di Yekîtiya Star de me ev sazî avakiribû di sala 2005an de, û barê me ji hêla bikaranîna rola jinê pir giran bû, lê me hemû zehmetî bihurtin da em qunaxeke baş ji jinê re çêbikin, û di baweriya min de em serketin. me kar dikir ku di destpêkê de em azadiya jina Kurd li Sûryayê bidest bixin da ew jî besdarî jyana siyasî bibe û ji doza milletên xwe bike ji ber ku jin nema di wan demên berê de ye, ew demên sîtem û zordariyê. û aniha em gelek xebatan dikan di warê têkiliyan de bi partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivil û bitaybetî jî ew ên ku di karê jinê de bispor in li seranserê Sûryayê bitevahî.



û wisa jî em çalakiyên mezin dikan jibo pêşxistina jinê weke semînar, helkeftinê civakî û herwiha jî rengîkirina çanda jinê da birastî bibe beşeke serekê di hemû asteyên civakê de.

û di hevdîtineke din de bi çalakvan Munteha Cengo re ya endama Yekîtiya Jinêndî Kurd li Sûryayê û endama rêxistina (DAD)e ya mafêن mirovan, li ser xebata jinê wisa axift: YJKS di dawiya sala 2013an de hate damezirandin û ew jî encama yekîtiyekê bû di nav herdu yekîtiyên jinê bûn, weke rêxistineke jinê ku rola xwe ya civakî baş bileyize di warê pêşxistina çand û ramana jinê û civakê bitevahî, herwiha jina Sûrî herdem amade ye ku bibe bingehêke bihêz ji têkoşînê re, û wisa şoreşa Sûrî ji me re diyar kiribû.

Me di YJKS gelek karên balkêş kiribûn, me semînar li ser mafê jinê û rola wê di civakê de li dar xistine, hevdem bi korsêن zimanê Kurdî û perwerdeyên yasayî û siyasî ...hwd..

Jina Kurd li Sûryayêgavin mezin avêjtine li ser rêya azadî û bidestxistina mafêن xwe û hêj di wê de berdewam e û weku dibêjin: Jin nîvê civakê ye, û dibe ku ev nîv saxlem be da nîvê din jî saxlem û dûrî nexweşîyan be.



kampaniya vaksînê (derzîkirinê) li parêzgeha Hesekê

Ne tenê kuştin, penaberî û birçîbûn pehra zarokên sûriyê bûn, lê belê wan pehareke mezin ji nexweşiyê jî xwar.piştî ku şoreşa sûrî kete rêya çekdariyê, êdî êş û azarêن gelê sûrî zêdetir bûn, ji ber wêrankirin û dorpêckirina bajaran, û qutkirina xwarin û dermanan.tevî wilo jî, gelek caran balafir û topên rêtîmê nexweşxane û navendêن tendurustiyê jî xwe re kirin armanc, di encamê de, gelek nexweşî di nav xelkê de –û bi taybetî di nav zarokan de- belav bûn wek lîşmania, zerikî (iltihaba kezebê) hwd. û gelek dermanêن nexweşiyê demdirêj êdî nema peyda dibûn wek nexweşiyê dil, nexweşiya şekir û hwd. Lê nexweşiya herî zehmet ya ku tirseke mezin xiste nav civakê pûciya zarokan bû. ev nexweşiya ku sala 1995 z yekem car li sûriyê hat tomarkirin, û di van rewşen neasayî de, careke din çend haletine nû li parêzgeha Dêrazorê hatin tomarkirin, ku li gorî jêderênet netewêن yekgirtî bi rêya malbatêن hinek çekdarêن islamî yên pakistanî gihiştiye sûrî. Pûciya zarokan nexweşyeke veyrûsî ye, veyrûs bi rêya xwarinê tê veguhestin û bi rêya pîsiya mirov ji laş tê avêtin. bandora veyrûsê ya serekî liser damarêن livandinê ye, ên ku ji birrbirreya piştê derdi Kevin. û wek encam ji pêketinê, masûlkeyên (edelat) ku damarêن wan bi veyrûs dikevin pûç dibin- bi taybetî masûlkeyên lingan-herweha, şiyana livandina wan kêm dibe û dibe sedema meşeke nesuriştî (meşa qop) ji zarok re. Hêjayî gotinê ye, ku ev nexweşî bêçare ye, ango hîç dermanek karîgerî lê nake piştî pêketinê, loma keristeya (wesîle) bi tenê bo jê biparêze standina vaksînê ye. Û wek hemû dizanin, sûrî bûye cihê şerekî dirêj, sînorêن wê vekirî ne, û tevger çûn û hatinê lê zêde bûye. loma metirsiya vê nexweşiyê ne tenê li ser sûriyê ye, lê belê li ser dewletên hawîrdor jî heye. ji bo wilo gelek rêxistinêن cihanî bal kişandin ser vê nexweşiyê, û zû bi zû vaksîn li hemû parêzgehêن sûrî û li penaberêن sûrî yên derveyî sînor belav kirin, û ew rêxistin ev bûn :



1-UNCHR (komisyonâ bilind a karûbarêن penaberan)

2- UNICEF

3- heyva sor a sûrî

4-rêxistina tenduristiya cihanî WHO Û bi alîkariya wezareta tendurustiyê ya sûrî di

8 / 12 / 2013 kampaniya yekem ya vaksînê destpê kir. Di vê çarçoveyê de Ciwan Remo ku yek ji endamên kampaniya a vaksîndanê bû li bajarê Hesekê weha ji Welat re axivî: karê min di çarçoveyeke tenduristî û mirovane de ye.em li hemû tax û gundêن bajarê Hesekê digerin, mal bi mal derbas dibin, çi zarokên yekrojî heya pêncsalî hebin vaksînê didin wan, rojane 1000-2000 zarok vaksînê distînin. kampaniya me heya meha (4) berdewam e. Selma Elî diya Alanê yekmehî wilo ji me re peyivî: bi rastî, pêşî ez gelekî tirsiyam gava min belavbûna vê nexweşiyê bihîst, loma gava grûpa kampaniyê hat taxa me, bi lez û bez min zaroka xwe gihad wan bo dana vaksînê, ez zor zor spasiya wan dikim, bi saya wan dilên me dayikan aram bûn. Dawiê, banga me bo hemû dayik û bavan, kampaniya vaksînê hîn berdewam e, tenduristiya zarokêن xwe paşguh nekin, bi du dilopêن di dev de, saxlemiya zarokêن xwe biparêzin.

Hisêن Reşîk




Daxuyanameya Mafêni Mirovan a Cîhanê

benda yekemîn di daxuyanameya mafêni mirovan de dibêje ku :

- Hemû mirov dema jidayik dîbin , azad in û di maf û rumetê de yeksan in . xwedî mêjî û wijdan in û diva be danûstandina biratiyê bi hev re bik in.

Eger em bi kurtî çîroka naskirina mafê mirovan bînin ziman em dikarin ji yasaya Hemorabî dest pê bikin jiber ew kevintirîn yasaya nivîsandî di dîroka mirovahiyê de ye ew vedigere sala 1790 B.Z, û ew ji hejmareke yasayan pêk tê , jixwe Hemorabî jî şeşemîn Şahê Şahnişîna Babila kevin bû . piştre nêzî sala 539 B.Z Şahê İranê Koreş derbasbû bajarê Babilê û wê çaxê biryareke gelekî girîng destnîşan ya taybet bi mafê sivil û siyâsî sala kir mîna şoreşekê bû ,wî da 1966 an û peymana navdewletî ya xuyanîkirin ku hemû kole azad in û herkes jî azad e bi hilbijatina ol û çandeyî sala 1966 an. Û hersê bîrûbaweriyên xwe bê ku ev yek bê girêdan bi nijad yan ci hatnerêziyên wî , û Koreş ev gotinên xwe liser kevirekî qawînî nivîsand û bicî kir ya ku bi "Qawina Koreş" tê binavkirin û ew bixwe zayîna mafê mirovan bû. Piştre gelek belge û hewildan derket in û li gelek deveran di dirjahiya dîrokê de tanî niha ji "Yasaya Xwezayî" ya Romayê" tanî bi "Magna Karta" ya Birîtanyayê û şoreşa Fransayê ya ku "lîsteya Mafêni Xwezayî" encam da , ta piştî du cengên cîhanî û hejmareke mezin ji wêranî û dewletên cîhanê lihev civiyan û di sala 1945an de Netewyên Yekbûyî damezirandin û di sala 1948an Daxuyanameya Mafêni Mirovan ronî dît , îca Daxuyanameya Mafêni Mirovan çiye û çawa hate sazkirin?



Daxuyanameya Mafêni Mirovan ya xwedî lê derketibû di sala 1948 an de, yek ji belgenameyên sereke yên navdewletî ye bo mafêni mirovan , û ev belgename cihekî girîng di yasaya navdewletî de girtye , ew jî tevî herdû belgenameyên peymana navdewletî ya taybet bi mafêni aborî û civakî û bijareyî bû.

Daxuyanameya mafêni mirovan 1948 an , bi destpêskiriya Îlînor Rozifilt û hejmarek (18 endam) ji rengarengî pisporan hate sazkirin ,lê kesê ku bendên daxuyanameyê saz kiribûn Rînê Kasan yê Frensî bû û bi alîkarî da , ta piştî du cengên cîhanî û rawêjkariya Şarl Malik yê Libnanî hejmareke mezin ji wêranî û yê ku wê wergerandibû zimanê kuştinê, dewletên cîhanê lihev Ingilîzî jî . Daxuyanameya ji 30 bendî civiyan û di sala 1945an de Netewyên Yekbûyî damezirandin û di sala 1948an Daxuyanameya Mafêni Mirovan ronî dît , îca Daxuyanameya Mafêni Mirovan ya ji Şoreşa Fransî di sala 1789 an de der hatibû û ji yasaya " Magna Karta" ya ku ji rûsipyîn birîtanyaya mezin der hatibû sûdê wer bigir e.

Daxuyanameya Mafêni Mirovan Cîhanê û ya ku Netewyên Yekbûyî ji sê beşan yan ji sê nivşan pêk tê û ew in :

- Nivşê yekemîn " mafêni azadiyên sivil û siyâsî " ye .
- Nivşen duyemîn " mafêni aborî û civakî û çandeyî" ye.
- Nivşê sêyemîn ewe "mafêni çarenûs û geşpêdanê û mafêni gerdûnî ji jîngeh û cîhanêke paqîj û durust"e.

Lê herdem ev pirs tê kirin ... gelo mafêni mirovan çin e? Û ka kî berovaniya wê dik e??

Dema ku fêrbûn mafêni mirov be çîma bi sedhezarân nexwende li cîhanê hene , û dema ku jiyanêke bi rûmet ji mafêni mirov e çîma bi sedan mirov ronjane tê kuştin yan ji birçîna dimirin, yan hîna gelek gel û komcivat ji mafêni hebûna xwe bêpar in ... h.w.d .

Zuhrab Qado



Fêrkirina zimanê Kurdî li Qamişloyê

Ziman nasnameya miletan e,Nîşana Hebûna wan e, û li sûrye zimanê Kurdî yê rewânbej bitenê nîviskar û helbestvan bi wî ve mane girêdayî tevî astengî û Qedexekirinê,û piştî şoreşê şoreşike nû hate afîrandin navê wê"şoreşa ferbûna Zimanê Kurdi"ye,û êdî paytexta Rojavayê Kurdistanê dest bi fêrkirina zimanê xwe kir,Herwiha gelek rîxistin û saziyên ziman hatine avakirin,"Saziya Zimanê Kurdi"yek ji wan saziyên ku mirov dikare bibêja saziya fermî ye ku bi kar û barê xwe radibe ji bo ziman,Endamê wê mamosta"Ciwan Umer"wiha got:Ev 3ê sal in ku „SZK"ava bûye û li hemû bajarê Rojava kardike,li dibistanan em zarakan hînî ziman dikin,ji pola(sefa)yekemîn û ta ya şeşemîn,pirtûkêwan cûda ne û „Hînker"ji xwendekarê zanîngehan re ye.. Hêja ye gotinê ku saziyekê bi navê "Ekadimiya Ziman" li Qamişloyê heye, Partiyêne Kurd jî xebatêne xwe yên taybet hene ji bo ziman,li navendêne xwe xuleyên ziman didin, lê jêder û şêweyên wan cûda ne Mamoste"Mihemed Kosê " ji hola"Partî " ji welat re got:30 şagirtê min hene temenê wan ji 10 sal û ta 50 salî ne,Bêhtir tîp û kîteyên

Kurdî(movikan)didim,çavkaniya min pirtûka"Sirûda Abeya Kurdi"ye ya „Mihemed Cemîl Seydo"ye. Herwiha jî bisporêne ku karê fêrkirina ziman dikin nerînin wan di mijara hînkîrinê de hene,zimanzan „Derwêş Xalib"ji Welat re li ser vê rewê axîfî:Rêbazêne zanistî di xuleyên ziman de bi kar nayêne,Herwiha fêrkirin bi şêwazên biyanan in,zaniyarêne zanistî dereng derbasî civakê dabin û sûd ji komîta fêrbûna ziman Kurdi"KFZK"hagîrin,lê tev şâşıyan pêşketin heye.. „Xalib"xalêne sereke ji bo serkeftina ziman nîşan kir: Bi fêrkirina 3ê asteyên sereke :

1-zimanê nexwendewariyê

2-zimanê kovaran.

3-zimanê wêje û zanistê


Bi van alav û şêweyan zimanê Kurdî li Qamişloyê tête belavkirin weke zimanekî ku dikare bibe zimanê zanîngeh û xwendekaran di pêşerojê de, herwiha weku mebesta berpirisiyarêne fêrkirina wî û daxwazêne wan.

Xunav Kano

Xwendina Kurmancî - - Ji bo şagirtê nû fêrî xwendinê dîbin

- Zîn. Zîn keçeke biçük e, ne mezin e.
- Li ku ye? Li Berlînê ye?
- Na, na, ne li Berlînê ye. Zîn li Kurdistanê ye.
- Li Kurdistanê?
- Erê, erê, li Kurdistanê ye.
- Li Heskêf e?
- Na, li gundê xwe ye. Navê gundê wê Salîk e.
- Gund çi ye?
- Gund ji bajêr pir biçüktir e. Xelkê gundan bi çandiniyê ve mijûl in. Hinek pez jî xwedî dikin. Zîn li gund e û gund li Kurdistanê ye.
- Rast e. Berlîn bajar e, mezin e, paytex tê Almanyayê ye, lê gundê Salîkê ne paytext e, ne jî li Almanyayê ye. Ew li welatê Kurdish e, warê Zînê ye.

Şahîn Soreklî





Şêx Seîd Pîran..



Şêx Seîd kurê Şêx Mehmûdê Neqîşbendî ye, Xwedê daye li gundê Keledarê di sala 1865an de, bavê wî mala xwe bire gundê Balo, Balo jî gunike di wîleta Gênc de.

Li ser destê bavê xwe Qur'an ezberkiriye, bi dûre zanistiya fiqh û şerî'eta îslamî xwendiye, û piştî xwendina xwe bi dawî kir bû zanistvanek û rîberek mezin li herêmê xwe de, û bi dû mirina bavê wî re, serdariya dînî kete destan. Şêx Seîd peyakî pir zane bû, behwerîyên wî nedihatîn bi gotinêni mirovan li ser şêxan, û maçkirina destan rakir, ji vê yekê gelek Şêxên nebaş bi tirkâ re doz girtin dijê wî, ji bo zanîngehekê wekû "zanista Ezher" venekê li bajarê Wanê... Şêx Seîd kar kir di politik de ji dema komelên kurdî hatin avakirin di nav bera 1908 û 1923an de, û gelek dostanî girêda bi malbatin welatparêz re wekû Malbata "Bedirxan beg û Şêx ûbêdullah nehrî" û gelek ji serdarên kurd.

Di peyîza sala 1924an de, dewleta tirkî hinek ji serdarên "komela Azadî" girtin, ji wan dû mîrxas "Xalid cibran û yûsiv zeya" dane ber guleyan di bajarê Bedlîsê de, bi dûre Şêx Seîd seroketiya komelê kir, û congerek çêbû li bajarê

"Heleb ê" de di çirîya paşî de sala 1924an. Şêx Elî Riza kurê Şêx Seyîd hate kongirê ji dîvla bavê xwe, û gelek ji serdarên kurd ji kurdistana bakur û rojava amadebûn di kongirê de... Di kongirê de biriyara şoreseke mezin hate standin, û roja Nûroja kurdan di 21 Avdarê de, bibe despêka şoreşa vegerandina mafênetewî ê kurda.

Ji bo piştgirtina kurda başbeji şoreşê re, Şêx Seyîd li kurdistanê geriya, û roja 5an ji sibatê gişte gundê Pîran bi hevaletiya 100 çekdar re, bi gîştina wî re komek leşkerê tirk bi serdariya mûlazim Husnî Efendî, hatibûn ji bo çend peya yê kurd bigrin, Şêx ji wan xwest kû di amadebûna wîde tukesî negirin, lê serdarê leşkeran erêkirin nekir, û şer di navbera wan de pêket, çend leşker hatin kuştin û yên dî hatin girtin ji aliye kurda ve....

Ev bûyer di roja 8ê sibatê de çêbû, lê dema nûçeyê vê bûyerê belav bû, serdarên kurda guman kirin kû şoreş despêkir, û êrîş berdan ser leşkerêne tirkâ li hemî cîgehan... Şêx Ebdilrehîm birayê Şêx Seyîd, bajarê "gênc" ê paqîj kir ji leşkerê tirkan, û kir paytexta kurdistanê ta Amed (Diyar Bekir) bê azadkirin.

Şoreş bi lezî belav bû li 14 wîlayetan ji kurdistanê, û bîtirê 600 hezar kurd û 100 hezar "Ermenî, Çerkes, Ereb û Aşûrî" têde şoreşvan bûn... şoreşvana Amed dorpêç kirin, lê mixabin nikarîbûn ji destê tirkan derxînin, dema hêzên turk bi çekêne giran ve nîzîkbûn ji Amedê ve,

şoreşvan bi paşde vegerian, lê tirkâ rî liber wan girt bi arîkirina Ingilîz û Ferensiyan, ji bo şoreşvan derbasî Sûrî, Îraq û Iranê nebin, û bi Trirêna di bin destê Fresa de bû leşkerêne Tirk sînor tev dorpêç kirin ta nîzîkî bajarê Müsilê...

Di vê şoreşê de Hezarê xaniyan hatin şewitandin, 400 gund di herêmê Agrîdag û Tenderîk de, û 300 gund di herêmê Çolemêrg û Hekarî de hatin talan û berebatkirin, û 15 hezar mirov hatin kuştin, û gelek Zarok, Jin û kal hatin noqkirin bi saxîti di behra Wanê de bi destê tirkan, ev tiştên ber çav bûn hovîtiya tirkâ da xwiyakirin, bilî tiştên ne ber çav.

Di meha Nîsanê de Şêx Seyîd û 47 ji serdarê şoreşê hatin girtin, û piştî mehkemekî bi derew ji wanre çêkirin, ew dad kirin bi şeniqkirin... Di 30ê gulanê de sala 1925an li ber kinirê, Şêx seyîd got:

"Her jiyanek dawî jêre heye, û ez ne poşmanim dema ez bibim qurban di ber milletê xwede", û bi dengekî bilind bankir "bijî Kurdistan".

Dema gotina Kurdistanê kete guhê tirkan, bê rûmetekî ji wan singiwê tifeka xwe li zikê wî xist, û qamçîbaz werîs li qirika wî pêça, û tevî êşa xwe wekû Şêr qîrînek da, û dîsa got: "bijî Kurdistan pêşeroj".....

Lê mixabin nehiştin careke dî bêje, ji ber deyûzê qamçîbaz rûniştek ji bin kişand.

Xorşîd Şûzî



KURDISTAN

Daykek min heye ne wek tu dayka ye
Çeleng , şox û her dem ciwan e
Hesreta hemû dilan e
Bejna wê pir dirêj e
Ji mehabat heta botan e
Ji Serêkaniyê heta koban e
Çavên wê ne wek Çavên tu jinan e
Rengînin birengê gulan e
Ferat û dicle ser bejnê diherikin
Mîna hêsrên mecnûn li ser leyлан e
Himbêz bi min gelek xweş e
û dîrok bi min gelek geş e
Ji Şêx Saîd heta berzan e
Xwişkêن min bi hezaran e
Welat parêz û canfidan e
Birayêن min leşkerêن li ser Çiyan e
Ji pêşîrêن wê mijandine
Lehngiya Mezlûm Doxan e
An jî şehîdin bi xwînê av dane
Xaka bav û kalan e
Dayê mixabin , ev dayka hemû kurdan e
Ev Kurdistan e...
Ev Kurdistan e...
Ev Kurdistan e...

Kamîran Fatemê 21\3\2013

Mîr Celadet Bedirxan



1893-1950

Kuro .. Keçê

Eybe..şerme..fehite, an hînî
zimanê xwe bibin an mebêjin em
Kurd in bê ziman Kurdîtî ji were ne
tu rûmete ji me re rûreşîk giran e
Heyf û xebînet û hezar mixabin
nemaze ji wan re ko bi zimanê din
dizanin bixwînin û binivîsînin û elf
abeya zimanê xwe hêj nasnakin "

Mîr Celadet BedirXan

" Hawar, hej 27 - 1941



Dîfterî (*Corynebacterium diphtheriae*)

nexweşîyeke sîstema bêhngirtinê ye. Di sîstema bêhngirtinê de bi riya bakteriyê toksîn çêdibe û zû derbasî yekê din dibe. Beriya ku derziyên parastinê ewçend nebişketîbû vê nexweşiyê canê gelekan digirt. Lê îro pirr kêm e. Li Kurdistanê ji ber xizaniyê û kêm-bûna derziyên parastinê dîsa jî can-stîn e. Toksîna ku ev bakterî di organîzmayê de dihêle gelek bixetere ye. Heya bigire dikare felcê jî pêk bîne.

Cara pêşîn di sala 1826'î de Pierre Bretonneau ev bakterî binavkiriye. Di sala 1923'î de derziya parastina vê bakteriyê hatiye dîtin

Hin cureyên dîfteriyê Difteriya poz (bêvle)

Dîfteriya stû (qirikê)

Dîfteriya zengilok

Difteriya li derî sîstema bêhvedanê, bo mînak guh, çav hwd

Her cureyê dîfteriyê gorî xwe hin sîmp

toman lidardixe

Sîmptoma dîfteriya poz

Herikandina poz

Hin simptomên dîfteriya stû (qirik)

Bêmadayî

Cirifin

Zêdetîna laş

Serêş

Verêş

Westîn (betilîn)

Hin caran di tevgera hişarê de xerabûn

Astengiyên mîzkirinê

Hin sîmptomên dîfteriya zengilokê

Kuxîna du dengî

Astengî di bêhnvedanê de

Werim di sîstema behnvedanê de

Helbet, sîmptom ne standart in û gorî asta nexweşiyê têñ guhertin. Dîfterî pirranî dereng pê tê derxistin. Divê mirov derziyên parastinê birêkûpêk bike. Divê mirov li dijî sawê têbikoşe.

Tedawiya nexweşiyê dikare bi qasî 2 mangê bidome.

Wikipedia





Sibe dê xwestir be...
بکرا بستر جن اطلاع...



Gurzek ji Gulan



Adarok Berfin



Gulçiçek Gulebûk



Mêxik Nefel



Sorgul Stêrgul



Beybûn Binefş



Gulgenim Helz

Ji bo xwedê
bangî Elî nekin

HELBEST YÜSIV

Li gundekî kevin zarokek hebû navê wî Elî bû ,Elî zarokekî jêhatî di dibistana xwe de bû û bi aqil bû û bi ya diya xwe û mezinan dikir ,ta ku di nav hemî mamesteyên dibistanê û dê û bavê zarokên gund bi edeba xwe ya baş hatibû naskirin.

carekê Elî û hevalê xwe Hemo ji dibistanê vedigeriyan û dema gihan cem mala Hemo baraneke xurt hat ,lewra Elî li mala Hemo ma ta derengî şevê ta ku baran sekinî ,di wê navê de diya Hemo hinek kar jê dixwest lê Hemo bi ya wê ne dikir ,û Elî ji ber vê yekê rexin li Hemo kir û ji dêv Hemo çû û firax dan hev û li metbexê alîkariya diya wî di çekirina xwarinê de kir û dersê Zekiye xuşka Hemo da wê , këfa diya Hemo geleki ji Elî re hat ,û dema wê ji Elî re got :"Xweska Hemo weke te ba kurê min ", Hemo ev yek deng kir dilê xwe girt û ji diya xwe û Elî aciz bû û di dilê xwe de got ez nema careke din Elî tînim mala me , hema Hemo nema zanîbû çawa Elî here malê û berî şev têkeve erdê Elî çû mal .

piştî demekê diya Hemo li ber derî li bendî hatina Elî ji dibistanê bû û pêre çû malê û ji diya wî re got: bela işev Elî li cem me bimîne , dema Elî bi diya Hemo re derbasî mala Hemo bû ,Hemo dilê wî kire kutekut û got diya xwe: "Ev li mala me ci dike", diya wî jêre got:" Dûvre tê nas bike" , Elî û diya Hemo çav ji hev re dan û dest bi karan kirin ,îca Hemo di hundirê xwe de dikeliya û dîn dibû ,Hemo ji diya xwe re got: Ezê alîkariya te bikim dayê û Elî tu here mala xwe" , lê diya Hemo got: "İşev Elî mêvanê me ye" û Hemo got: "Na bela here "û di hundirê xwe de dîntir bû ,dawiya şevê Hemo got diya xwe: "Bela Elî here mala xwe" , lê diya wî jêre got "Elî işev mêvanê me ye ",berî razanê Hemo çîrok fêm kir ku diya wî Elî aniye ji bo ew bi edeb bibe û di hundirê xwe de digot : "Ma dê kengî sibeh bê û ev kur bîqelete'e mala xwe û ez îca bi ya diya xwe bikim " .

Sibeh hat, Hemo Elî ji xew rakir û jêre got: "Elî de here dibistanê" ,lê Elî jêre got : iro ïn e û dibistan tuneye û bihêle ez razim" ,îca Hemo dîntir bû ,berî nîvro Elî çû mala xwe piştî ku dilê Hemo ji qehra Elî û razana wî li cem wan werimî,piştî çend rojan diya lawikekî din yê bi ya ehlê xwe ne dikir çû wek diya Hemo Elî anî mala xwe ,ta ku diya hemî zarokên taxê û dibistana Elî , Elî tanîn mala xwe bo zarokên wan bi aqil bibin .

Piştî demekê kîjan zarokê taxê ku bi ya dê û bavê xwe ne dikir û dersê xwe ne dixwend , diya wan ji wan re digot: " Bela işev Elî li cem me razê an na", zarokan digot: " Na ji bo xwedê ez ê bi ya te bikim " .

المعاناة النفسية لسكان روج آفا بسبب إغلاق الحدود



سبب إغلاق حدود إقليم كردستان في الفترة الأخيرة الكثير من المعاناة النفسية لسكان روج آفا ، فمنذ بداية الثورة سبب الحصار الاقتصادي الخائف المفروض على المناطق الكردية في سوريا بالإضافة إلى الظروف الأمنية السيئة التي أدت إلى هجرة الآلاف من السكان إلى إقليم كردستان فمن النادر إن تجد عائلة كوردية في روج آفا ليس لها قريب أو عزيز في الإقليم لذا في إغلاق الحدود مؤخراً كان بعثابة حاجز بين رؤية الإباء والابناء والأحبة مما سبب ذلك الكثير من المعاناة العاطفية لهم.

وهناك أيضاً معاناة من الطرف الآخر من الساكنين في الإقليم ، كيم محمد العمر 30 سنة يعمل محاسب في كفيفيريا في جبل كورك تزوج منذ فترة يقول "لقد أصبح لي أكثر من سنة هنا و كنت خاطب ولم استطع الذهاب إلى روج آفا لكي أتزوج بين أهلي لذا فقد أتى أبي المريض بخطيبتي كمراهقة له إلى وتزوجنا بدون حفلة ودون أن تلبس زوجتي الأبيض وذلك بسبب بعدي عن أهلي مما سبب لي الكثير من الحزن بدل من أن "أفرح في هكذا مناسبة لذا فقد كان مطلب الكثير من التقينا بهم هو أن يفتح باب الزيارات فقط لا الهجرة وخاصة من هم بداخل الإقليم فالكثير منهم حتى في حالة الوفيات لم يستطيعوا المجيء مما سبب ذلك لهم حالة نفسية مزرية فتطبيقي أجراءات مناسبة لذلك قد يخفف قليلاً من معانات هؤلاء الناس بعيداً عن الصراعات الحزبية الضيقة .

نوفين مرعي

ومن خلال رؤيتنا لبعض الحالات في روج آفا فقد كان مطلب البعض منهم لم الشمل وبعض الآخر يريد فقط الزيارة لمدة أسبوع فعلى سبيل المثال سلوى البالغة من العمر 24 سنة عقد قرانها منذ أكثر من عشرة أيام تقول "لقد تمت خطبتي بدون خطيبني وفي يوم الزفاف أتيت إلى بيت حمي بدون وجود العريس وذلك لعدم قدرته على المجيء بسبب إغلاق الحدود لأن الذي يغادر الإقليم لا يسمح له بالعودة ثانية والآن إنما انتظر بان يطبق إدارة معبر سيمالكا تنفيذ القرارات المتعلقة بلم الشمل لكي استطاع الذهاب واللحاق بعربيسي فأن لم يطبقو ذلك سأحاول أن "أذهب كمراهقة لأحد المرضى أن استطعت وبالرغم أن الحدود مفتوحة أمام الحالات الإنسانية إلا أن المرضى أيضاً يعانون من صعوبة في الذهاب إلى الإقليم، فعلى سبيل المثال عبد الله في - 55 - من العمر مدرس مدرسة لديه ابن وابنة في مخيم دوميز وهو ساكن في بلدة جل آغا / جوادية يقول "لقد أصبح لأولادي قربة سنتين في مخيم دوميز وبما أنني مريض قلب اعتدت بأنني سأتتمكن من الذهاب لرؤيتهم لمدة أسبوع وبالرغم من مرضي فقد ذهبت ثلاثة مرات إلى الحدود ومعي تقاريري الطبية إلا أنهما لم يسمحوا لي بالمرور تارة بحجة أنني لم أجري عملية قلب مفتوحة وتارة بأن دور مرضى القلب لم يأتي بعد وأضاف قائلاً في كل مرة أدفع ثلاثة آلاف



انتفاضة قامشلو

ما خلف عدد كبيراً من القتلى والجرحى ، الذين عولج معظمهم سراً حيث كانت تسعى السلطة لقتل الجرحى ، فهبت الجماهير المغذورة إلى إسقاط أصنام السلطة في المناطق الكوردية ، كان ذلك بداية السقوط العريض لهيبة النظام الحديدي . ردت عليه السلطة بجزء كبير من شباب الكورد في السجون ، وتعذيبهم حتى الموت . وتعرض الناجون للكثير من الأذى الجسدي والنفسي . إنفاضة الكورد في القامشلي التي هزت الشوارع النائمة . كانت إنفاضة الجسد الواحد . استفاقوا على وقع جراحهم لتلمس هوبيتهم المسلوبة واستيقنوا على أن انتفاضة العميقة بعمق خمسون عاماً من الإضطهاد . امتدت الانتفاضة لتشمل جميع المدن الكوردية في الشمال السوري ثم امتدت إلى المناطق الكوردية في دمشق . ووقف الكورد يومها بصدورهم العارية ليواجهوا رصاص أعتى ديكاتوريات العصر . تلك الصدور التي أمست قبلة الكورد . وقدس أقداسهم واستغل الكثيرون من الموظفين من غير الكورد ، الذين دأبت الدولة على إبعادهم وتعيين عمالئها المحترفين في أغلب المراتب الإدارية عادة . و الملاحقين بمحاكم اقتصادية استغلوا الأحداث وسارعوا إلى إشعال النيران يشعرون النيران في مراكز الاله ومؤسسات الدولة التي كانوا يعملون فيها . بادروا إلى إحراق جميع المستندات والوثائق التي تدينهم وثبتت ضلوعهم في السرقات المليونية . وليعودوا بعدها إلى أعمالهم بثوب البراءة بعد عمليات سطوهם الكبيرة على أموال الدولة . ثم أنسقت جميع تلك الأعمال إلى الكورد وإتهامهم بالإرهاب بداعع العمالة لأمريكا . أما الكورد البارزين في مراكزهم العلمية والوطنية فقد أنساب إليهم أعمال إجرامية ، من قبل أخصائي الأمن في تلفيق التهم و الدعايات الكاذبة ، لتشويه مكانة لهم والليل من سمعتهم . وبقيت تروج هذه الدعايات وتنفس نارها كلما همدت عبر مأجوريها ومرتزقتها ، في مجتمع يعيش على الدعاية ، حتى أن بعض المتهمنين كانوا خارج المكان ، بحكمة صدفة السفر أو المرض . والتي أثبتت زيف السلطة ، وأيغالها في تشويه الوجود الكوردي ومحوه . وإنكاره . إنفاضة قامشلي خذلها الجميع وبقيت في البقية وحدها . لكنها أ Mata اللثام عن وجه السلطة الحقيقية ، لتبدو بوجهها المشوهة ونواياها في التشتيت بالسلطة من خلال القمع والتكميل وإشعال حرب أهلية توقدها في الخفاء ، وترتدي من جديد عباءة القاضي . وتاتي البقية لتنهجأ وجه السلطة بعد عشرة أعوام من قراءتنا الجمهورية لوجهها الماكرون وما خلف سطوة السوداء



بعد المخاوف التي اختصرت في ذهن السلطة في سوريا من غزو أمريكي يهوي بالسلطة ، كما هو بالبعث والوجود الصدامي في العراق . وبعد مخاوفها من إرتياح كل القوى الديمقراطية ، لزوال طاغية العراق . وارتياح الكورد خصوصاً لسقوطه المدوي . نتيجة ما أقرفه بحقهم من جرائم إبادة جماعية . أحست السلطة الهمجية في سوريا بذنب أجelaها . فخططت للبدء بإشعال المنطقة الكوردية من خلال حرب أهلية سعت لتفعيelaها عبر أحداث القامشلي . التي بدأتها السلطة ، بتحريض بعض العناصر الشوفينية الواقعية تحت أمرتها ، بعد أن جهزت السنواريو في مطبخ المؤامرات ، لتفتن الرأي العام أنها وقبرة من هذا الإخراج ، وهؤلاء الممثلين والممسر . وأن الأحداث وقعت بعيداً عن سيطرتها . وبدأت في مكان بريء لا وهو الملعب البلدي بالقامشلي لتسبغ على فعلتها ثوب البراءة البعيدة عن سبق الإصرار والتصميم والتخطيط والتبييض من جهتها . وأن الأحداث بدأت عفوية وأنتهت بحرب أهلية . بدأت الأحداث بقدوم فريق دير الزور لكرة القدم ، إلى القامشلي ولكنه بدل أن يتوجه إلى الملعب جال في شوارع المدينة مردداً هتافات جماعية بشتم رموز وقادرة الكورد . وبشكل متكرر وعلني وصارخ . فوجئ الأهالي بقاقة الشر التي تحمل العصي والسكاكين وحجارة سوداء من جانب الخط الحديدي في دير الزور . ملأت بها حيائهم . قال شاهد عيان من القامشلي كان قداماً من حلب أنه غفا في الطريق واستفاق على ضجيج وجلة داخل القطار ، ورؤية أناس يجمعون حجارة ويحيطون بها حيائهم . ظن لأول وهلة أن القطار يتعرض إلى عملية سطو على يد عصابات مسلحة ، وبقي لعدة دقائق يجمع شتات ذهنه . حتى اتضحت له الصورة . في الملعب فوجئ المفترجون بمطر الحجارة السوداء ذاتها ، وبدأت الإشتباكات بين اللاعبين والمفترجين العزل ، وبين القادمين من حملة العصي والسكاكين والحجارة السوداء ، ليقوم محافظ الحسكة المدعو سليم كبول الذي بالإيعاز للأجهزة الأمنية المتواجدة بالبدى باطلاق النار وقتل العزل بالرصاص الحي . سقط على أثره عدد من القتلى والجرحى من الكورد حضرا ، رغم أن المفترجين كانوا من جميع ألوان الطيف في القامشلي .

في اليوم التالي خرجت الجماهير الكوردية بشكل عفوي بعيداً عن الأحزاب الكوردية ، لتشييع قتالها في جنازة مهيبة ، فلحقتهم الأحزاب الكورية فيما بعد لتصدر المشهد ، و تعرضت جماهير المنشعين مجدداً إلى إطلاق النار من قبل عناصر الأمن بشكل كثيف .






Serjêr

1-êş – şan .
2-tê vexwarin,bê reng û bêhn û tade- tîp
3-ji balefira ye,û nîşana aştiyê ye.
4-dera ku weşana Radyo dike- agir (b).
5-tersê jêr- yek ji navên lawan e .
6-tersê dereng- terse nebû.
7-dera ku purtük têde têne afrandin û da
8-tersê kevn(b) - yê ku ji Aedm be .

Rast

1- sûlav-tersê hatin.
2- ji zayinê ye-derê bilin ku li hember
bayê sar e .
3- kom an civatek .
4- sinc (b)- ji axînê ye.
5- paytexta komara Qadî Mihemed.
6- tersê şiyarbûnê- terse rabe .
7- tersê belê(b)-agir – bo nîşana me .
8- belgeya dawîkirina zanistanê .



Ferhengok

Belgeder	=	مُبَرَّهَن
Pert - Belawela	=	مُبْعَثِر
Xweyî - Nas	=	مَأْلُوف
Azardîtî	=	مُتَادِي
Pilangîr	=	مُتَاءِمَر
Hev hêz-Hevkêş	=	مُتَكَافِي
Hevyek	=	مُتَنَاطِر
Dijyek -Nakok	=	مُتَاقِضٌ
Ciya ciya	=	مُتَفَاقِوْت
Bêper	=	مُتَاهِي
Cur bi cur – Cûre cûr	=	مُتَنَوِّع
Bêlaf - Bê fîz	=	مُتَوَاضِع
Navîn - Naverast	=	مُتوسِط

Ji tûrikê Kurdî yê kevnare

Ji mêj ve , Kurd navdar bûn bi cûrbicûra demên xwarinê, di rojê de şeş caran xwarin dixwarin , û her carekê jê bi navekî taybet bû û di demeke xuya de bû
1- Qeretûn 2- Xurînî 3 - Taştê
4 - Firavîn 5- Şîv 6 - Paşîv
*Her sê xwarinên pêşî, bo dema sibehê bûn , ji demjimêr 4 û nîv ta 9 û nîv , û xwarina sereke Firavîn bû li dora demjimêr 12 .. û ji xwe Şîv di dema ku roj diçû ava, û ya her' dawî Paşîv ew gava şevbuhêrkê de bû, ango demjimêr 8ê êvarê ...

Peyva wendayî ji 7 tîpan e, navê helbestvaneke Kurd e ji Serê Kaniyê , ji dîwanên wî (Serxwebûn).

B	Ş	ê	R	î	N	ê	N	N
H	E	S	E	K	ê	A	î	N
K	O	V	A	N	M	W	A	ê
Z	A	P	B	I	X	M	T	U
N	A	U	T	R	S	S	O	R
K	A	Ş	E	O	H	X	A	K
A	I	G	O	T	D	X	E	R
N	E	P	Ü	D	O	I	A	M
C	A	P	A	R	A	S	L	D

Pût - Hesekê - Şêrînê - Kovan - do - Aras
em - dax - na - Zap - Ceger xwîn - Niştiman
Apo Osman - Xak - Sor - tu - dil - ka



Pend û Şîretên pêşıya

- Mejiyê sivik barekî pir giran e !
- Deng ji tasa vala tim bêtir tê !
- Av bi dilop dilopan keviran kun dikin !
- Giyayê male timî tal e !
- Yê ku diz be , şevêne reş pir in !

belê ji civakeke sivil re



ولات (ثقافية . عامة . مسوقة) . نصف شهرية

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

العدد (٩) ١٥ / آذار ٢٠١٤